

Hêviyek Mezin

Azad Kurdî*

Dîroka siyasî a Kurdistanê tejî xedr û îxaneta dijminên Kurdan li hember keç û xortên wî gelî ye. Ji bilî kavilkirina gund û bajarên Kurdan, zilm û zordarî, asîmîlasyon û tunekirinê, girtin, îşkence û kuştina kurdan û wd beşek ji pêvajoya serkut û çewisandina gelê Kurd bûye. Lê yek ji metodên qirêj û gemar Şehîdkirina rêberên Kurdan bûye.

Rêber û kesayetiyên mezin û bilind di nav gelan de hêsan çê nabin. Di her civakê û di nava her gelekê de, rêber rolek sereke, girîng û bi bandor di rêvebirin û pêşdebirina xebata wî gelî de dilîzin, lewra herdem yek ji armancên dijminên kurd û Kurdistanê, ji nav birin û kuştina rêberên Kurd bûye. Dîroka xebata siyasî û mafxwaziya Kurdistanê şahidê rastîn yê vê rastiyê ye. Heta niha bi vê armancê û bi mifahwergirtin ji metodên gemar, dehan rêberên Kurd hatine teror û Şehîdkirin. Armanca dijminan eva bûye ku bi lêdan û tunekirina mejiyên Kurdan – anku rêberan – pêşiya xebat û berxwedana azadîxwazî û berevanî ji mafên neteweyî bigirin.

Tevgera rizgarîxwaziya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bi sedema meşandina vê siyasîyê ji aliyê dijminan ve, çendîn rêberên leheng û navdar ên xwe ji dest dane. Di sedsala 20'an de, polîtîka han bi xurtî li ser gelê Kurd hate meşandin. Ji ber ku xebat û berxwedana Kurdan germ û gurr bûbû, di vê navberê de rêberên wek Simayîl Axayê Şikak, Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî û dehan rêberên din li pêşiya karwana şehîdên têkoşîna azadiyê di Rojhilatê Kurdistanê de bûn gorî.

Ji ber pêşengbûna PDKÎ di têkoşîna azadiyê di wê parçeyê Kurdistanê de, piraniya rêberên navdar û mezin yê şehîdkirî ên Kurd rêberên vê partiyê bûne. 3 rêberên navdar ên Kurd, Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî û herwiha dehan endamên din ên rêberiya partiyê, gorî û bedelên vê partiyê bûne ku jiyana xwe kirin qurbanîyê azadiya Kurd û Kurdistanê û hertim wek rûmet û simbolên gelê Kurd û PDKÎ hatine/tên hesabandin.

26'ê Xermanana 1387 (16'ê Îlona 2008)'an, 16'hemîn salvegera teror û Şehîdkirina rêberên navdar ê Kurd, Dr. Sadiq Şerefkendî, Sekreterê Giştî yê PDKÎ û hevalên wî: Fetah Ebdulî, endamê Komîteya Navendî û nûnerê partiyê li derveyî welat, Humayon Erdelan, berpirsiyarê partiyê li Almanya û Nûrî Dêhkurdî kesayetiyê siyasî ê Îranî û dostê gelê Kurd bû.

Di 17'ê Îlona 1992'an de, çend seet piştî beşdarîkirina şanda han a PDKÎ bi serokatiya Dr. Sadiq Şerefkendî di Kongreya Enternasyonala Sosyalîst de li Berlînê, dema bi komek kesyaetiyên siyasî ên Opozîsyona Îranê re civiyabûn, kete ber êrîşa terorîstên Komara Îslamî ku ji aliyê desthilatdarên herî payebilind ên rejîmê li Tehranê fermana wê terorê hatibû dayîn û bûne goriyên siyasîyên terorîstperwerane ên vê rejîma gemar û Şehîd bûn. Armanca Dr. Şerefkendiyê nemir eva bû ku dixwest bi lidarxistina van cure civînanan li Ewropayê, bi rêya gotûbêj û diyalogê yekîtî û hevbendiyê xurt di navbera hêzên siyasî û neyarê rejîma Komara Îslamî a Îranê pêk bîne. —————>